



Seyr e...



Mêrî (kurmorî, gêre) dikare barekî 52 caran ji xwe girantir hilgire.

Sîsirka yekşaxî (cureyeke kêzikan e) dikare barekî 850 caran ji xwe girantir hilgire.

Eger hêza mirovan bi qasî ya mêrîyê ba, wê demê zarokekî pênc salî dê bikarîba filek hilgirta. Ji xwe eger hêza me bi qasî sîsirka yekşaxî ba, wê demê ew zarokê pênc salî dê bikarîba 17 filan bi carekê de hilgirta.



Mikael Kîrnî zarokekî amerîkî ye, di dehsalîya xwe de karî bawernameya unîversîteyê bi pileya nayab ji Zankoya Alambamayê werbigire. Bi vê çendê ew dibe biçûktirîn mirovê ku ev bawernameya wergirtîye.



Salane 500 000 km³ (Pêncsed hezar kîlometrekubîk) av ji okyanûs û deryayan dibe hilm û ber bi asmanan ve bilind dibe û paşê dibe berf û baran û dibare.

Kangurû heywaneke ku li Awustralyayê dijî. Salê carekê dizê û têtjikekê bi tenê dike.


Tiştê seyr ew e ku dirêjahîya têtjika wê du cm û giranîya wê jî yek gram e.



Iê rast e !





Mirovekî awustiryayî (nemsayî) bi navê Jon Herbinger ji Vîyanayê heta Parîsê li ser destan çûye. Ev çûyina wî 55 rojan kêşaye û rojê deh saetan li ser destan bi rê de çûye. Wek tê zanîn Parîs û Vîyana 1400 km ji hev dûr in.



Li Rojhelata Afrîkayê gulek heye, ew digel helatina rojê hêdî hêdî dibişkive û heta nîvro bi yekcarî vedibe. Paşê hêdî hêdî devê xwe digire û dema roj diçe ava bi yekcarî devê wê tete girtin. Xelk vê gulê wek saetê bi kar tînin û pê demên rojê nas dikin.



Di sala 1939ê de sed hezar  pilingên Bengalî li Hindistan, Bengladêş û Srîlankayê hebûn. Di 1970yî de bi tenê pênc hezar jê mabûn. Anku di 31 salan de 95 000 piling bi destê mirovan hatine kuştin yan jî destê mirovan di mirina wan de hebû.

Niha hejmareke pir kêr jî wan  maye û ne dûr e ev ajela ciwan jî ber bi nemanê ve here.